Newroz Hejmar (75) Rûpel (8) Êlûn 2007z – 2619k

Gotina rêxistina Kobaniyê ya Partiya Yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê

Gelî camawerê hêja….!
Dost û hevalên hêja ….!
Em zor xemgîn û cav bi hêsirin bû kockirina lawê kurd , lawê gundê MARATA delal,nemir EDÎB ÎBRAHÎM (bavê pêşrew)
Gelî guhdarên hêja….!
De ka em ji xwe bipirsin çima em tev îro di nav goristana gundê MARATÊ de li ser gora hevalê hêja EDÎB li hev dicivîn, ji ber ku xebatkar bû û hemî temenê xwe kiribû xizmetî gelê kurd û ji roja rojê de bê dûdilî xebata xwe ya rojane li gor rêbaz û armancên partiya xwe li dijî pîlan û pirojên awarete yên ku rêjîma sûriyê di dermafên gelê kurd bi karanîn .
Gelî beşdarên birêz ….!
Dive em bawer bikin ku mirin her mirine lê ya mirovê xebtkar, rewşenbîr, dilhezê gel û welatê xwe ziyanek û valabûnek zor mezin bi kocbarkirina xwe re tînê holê , lê em Karin bêjin ku hevalê EDÎB (BAVÊ PÊŞREW) bi can û laşê xwe ji ber cavên me dice, lê kar û xebata hevêl ku li hemberî karbidestên sûriyê yê ku netewa kurdî ta roja îro ji hemî mafan bê parkirî di nav dost, heval û hogirên wî de jîndayî dimînin.
Bi rastî em çiqas bipeyvin em nikarin di demek wiha de kiryarên baş û xweş yên hevalê EDÎB ji hev re bijmêrin ji ber ku her yek ji beşdaran hinek ji wan kiryaran li ba heye .
Em soz didin bavê pêşrew ku dê partiya wî her li ser wê riya kurdayetiyê bimîne , û kesên wekî wî yên bimînin stirkin geş di asmanê kurdistanê de.
Li dawiyê bi navê RÊXISTINA KOBANIYÊ YA PARTIYA YEKÎTÎ YA DEMOKRAT A KURD LI SÛRIYÊ serê xwedî , heval, hogirên bavê Pêşrew saxbe û aram ji dayîka Pêşrew û herdu zarokên wê (pêşrew- zaredeşt) re
Û sed hezar silav li giyanê wî be û ciyê wî bihuşt û gul û rihan be .

Gotina Newrozê

Xwîşk û birayê hêja û delal

Di 18 vê Tebaxê de, li dûriyê, Almaniya Kurdhezek, partîzinek û zimanhezekî Kurd, ji nav me barkir û çû ser dilovaniya xwe. Û îro, di 26 ê tebaxê de, li mezelê gundê Maratê , li bin dara reş tê veşartin.

Kurd dibêjin : Ga dimrê çerm dimînê, mirov dimrê nav dimênê

Çînî dibêjin : Mirinek heye bi giraniya perekî û mirinek heye bi giraniya çiyakî . Di rûyê we tavan re xuyaye ku, barkirina kek Edîb çiqas girane. Ji ber ne ji xwe re bû, ji we re, ji gundê Maratê, gelê xwe û ji welatê xwe Sûriyê re bû.

Baş li bîra mine ku, di sala 1972 an de, kek Edîb, hejmarên Gulustana Seydayê Cegerxwîn hepêzdikirin û ji dost û hogirên xwe re dixwandin û di dûrer bi elfebaya APo Osman Sebrî jî, xwendekar hoyî zimanê dê dikirin.

Di sala 1995 an de, civatek li Helebê geriyabû , yek ji beşdaran kek Edîb bû, ji berhemên wê civatê, yekem rojname bi zimanê dê Newroz bû. Kek Edîb bi pênûsa xwe rûpelên Newrozê dixemlandin.

Û sipas ji guhdariya we re.